Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

# Vîdyoyên nû agahiyên bingehîn (di) derbarê proseya penaxwaziyê didin penaxwazan

Daîreya Koçberan hinek vîdyo bo penaxwazan çêkirine (di) derbarê qonaxên cuda yên proseya penaxwaziyê. Armanca vîdyoyan ew e ku bi awayekî heta mimkin be zelal û têgihbar proseya penaxwaziyê ron bikin.

## Vîdyoyan li ser kanala Youtube ya Daîreya Koçberan bibîne

Ev vîdyoyên jêrîn li ser kanala Youtube ya Daîreya Koçberan hene:

- Dawakirina penaberiyê li Fînlandayê
- Bi çi sebebî mirov dikare dawa îqameyê bike?
- Di proseya penaxwaziyê de kî çi dike?
- Lêpirsîna penaberiyê
- Bendewariya biryarê
- Biryara erênî
- Biryara neyînî

Dikarî derbarê vîdyoyan agahiyên zêdetir ji karmendên navenda (kampa) xwe ya penaxwaziyê bipirsî.

Vîdyo wek beşeke projeya ONE hatine çêkirin. Armanca projeyê ew e ku penaxwaz agahiyên baş wergirin (di) derbarê proseya penaxwaziyê û maf û erkên xwe di proseyê de. Projeya ONE ji aliyê Fona Penaxwazî, Koçberî û Hewandinê (AMIF) ve hatiye destekkirin.

Di projeyê de ji bilî vîdyoyan herwiha belavoka Agahî bo Penaxwazan jî hatiye çêkirin ku agahiyên bingehîn (di) derbarê dawakirina penaberiyê died (dide). Polîs yan karbidestên (zêrevanê) sinorî dê belavokê bidin te gava ku dawa penaberiyê bikî. Belavok herwiha li ser malpera Daîreya Koçberan jî heye.

## Materyal bi hevkarî li gel penaxwazan hatine çêkirin

Di projeyê de hewl hatiye dan ku materyal baş bi kêrî mişteriyan bên. Loma materyal bi hevkarî li gel penaxwazan û karmendên navendên (kampên) pêşwazîkirinê (penaxwaziyê) hatine çêkirin.

Vîdyo li zimanên pir axiftî yên penaxwazan hatine wergerandin: erebî, derî, inglîzî, farisî, somalî, soranî, tirkî û rûsî. Belavok ji bilî wan zimanan herwiha bi albanî, spanî, kurmancî, fransî û swêdî jî peyda dibe.

**Vîdyoyan bibîne:** migri.fi/videot-turvapaikanhakijoille

**Belavokan bibîne:** migri.fi/esitteet-ja-julkaisut#turvapaikka

Kurmandzhi: Uudet videot kertovat turvapaikanhakijalle turvapaikkaprosessista